Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1243 29-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

## Jinên Kurd bi berhemên xwe beşdarî pêşangeha li Tehranê bûn



**Bi boneya şeva Yelda berhemên dest ên ji aliyê jinan ve hatine çêkirin li mala Heft Dest a li Tehranê di navbera rojên 12-13'ê Kanunê de hatin pêşandan. Pêşangeh ji aliyê welatiyan ve rastî eleqeyek baş hat.**

Bi boneya şeva Yelda berhemên dest ên ku ji aliyê jinan ve hatin çêkirin bi armanca nîşandana çandî, li mala Heft Dest a li Tehranê pêşangeha hunerên dest hat vekirin. Hejmarek zêde ya jinan ji herêmên cuda yên Rojhilatê Kurdistan û Tahranê beşdarî pêşangehê bûn. Di pêşangehê de nexşandina sepete, ecoPrint (çap), kilîm, berhemên aksesuar hatin pêşandin. Pêşangeha ku welatiyan eleqeyek mezin nîşan dan, di navbera rojên 12-13'ê kanûnê de hat lidarxistin.

Çapa ekolojîk (ecoprînt), ji aliyê hunermend India Flint ve hatiye dîtin û li ser tekstîl, rêbazek çapa nebatane û bi temamî bi rêbazên xwezayî reng û awa dide. Xwendekara dîzayna tekstîlê ye du sal in Eco print çêdike Mozhgan Ardalan beşdarî pêşangehê bûye wiha got: "Eco prînt, çapek hawirdor ku tê de materyalên xwezayî, mîneral hatine bikaranîn e. Qumaşê wê ji malzemeyên mîneral tê dîzaynkirin, em tînin halê çapê, piştre jî em amûrên xwezayî bi kar tînin û girover dikin û dibin bihara zêde de piştî du saetan li ser pelên wê bi hemû demaran çap tê kirin. Êdî ji bo riyeke parastina hawirdorê, qalikê pîvazê, qalikê hinarê, qalikê gûz û raventî em dikarin bi kar bînin."

**'Bi qasî pêwîst e piştgirî ji hunera me re nayê nîşandan'**

Peykertiraş Elham di pêşangehê de hunerên xwe yên kûzik pêşanda û diyar kir ku ji ber kêmaniya piştevaniya madî û sermayeyê, odeyeke xwe veguherandiye qada xebatê û destnîşan kir ku berhemdayîn nîn e û got: "Mînak û modêlên her tiştî hene û ez berhemên xwe li ser înternetê difroşim. Mirov bi qasî ku pêwîst e piştevaniya vê hunerê nakin. Gelek caran ez bêhêvî bûm. Lê belê ji ber min hemû sermayeya xwe li vî karî xerc kiriye, divê ez ji nû ve dest pê bikim." **NÛ JINHA**

## FERHENGA BIWÊJAN

**Em siwaran bigirin peya her yên me ne:**
- Em destpêkê tiştên zehmet bikin, tiştên hêsan jixwe ne pirsgirêk in.

**Ew cire pîne bû:**
- Ew pirsgirêk çareser bû.

**Girêka xwe ber bi xwe ve aniye:**
- Hindik maye rewşa wî xweş bibe; hindik maye kêşeya xwe çareser bike.

**Ji avrûyê re got:**
- Xwe jê xilas kir; belaya wî ji xwe vekir.

**Ji ber piyê xwe rakir:**
- Ji holê rakir; bela anî serê wî; kuşt; ji wir dûr xist; ji astengî derxist.

**Ji stûyê xwe deranî/ji stûyê xwe derxist:**
- Xwe jê rizgar kir; belaya wî ji xwe vekir.

**Ker naçe ber bar bar diçe ber kerê:**
- Eger wisa nabe wê bi rengekî din bibe; wê her çareseriyek peyda bibe.

**Kor û keçel ji hev qetiyan:**
- Her kesî cihê xwe diyar kir.

**Ma mirin e ra jê nabe:**
- Mirin tenê çare jê re nîne weke din çi dibe bila bibe mirov dikare çareser bike.

**Min behir qam kir:**
- Min ji pirsgirêkê re çareseriyek peyda kir.

**Mîr dimire evdal dijît:**
- Wê çareyek peyda bibe; xemê nexwe; Xwedê mezin e.

**Ne ker ketî, ne bar qulibî:**
- Çawa ku tiştek nebûbe.

**Riya xwe vekir:**
- Pirsgirêka xwe çareser kir.

**Weke benikê gorê verêsa:**
- Pirsgirêk tev çareser bûn; çareserî li dû hev hatin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Têkoşîna jinê di qada çand û hunerê de

Navenda Nûçeyan

**Hunermenda Opêra Mizgîn Tahir da zanîn ku armanca wan ew e ku çanda muzîkê ya gelê Mezopotamyayê digre nava xwe; muzîkên Kurdî, Suryanî, Erebî û Ermenî dewlemendiya ruhê hevpar derdixe holê.**





Jin li dijî zihniyeta mêr ku jinan ji her qada civakê dûr xistiye û îradeya wan şikandiye, di her dema dîrokê de têdikoşin û bi ruhê yekîtî û rêxistinkirî tabûyan şikandine, li dijî sîstemê bi awayekî çalak rawestiyane. Şoreşa Rojava, weke şoreşa jinan hat dîtin û hemû kes xwedî lê derketin. Di pêşketin û vegera şoreşê de bi taybetî kombûnek jinan a bi kok ku xwe dispêrinê heye. Her wiha hest û fikrên wan, teyîsîn, ruhê wan, xwedî mîraseke çandî ya dîrokî ye. Çand û hunera Kurdî ji aliyê her kesê ve tê zanîn. Civakên ku xwedî çanda kombûnê ne û di dewlemendiya xwe de dijîn, ji aliyê desthilatdariyê ve rastî zext û êrişan tên, rastî qirkirina çandî tên. Li tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan navendên çand û hunerê hatine vekirin û xebat didin meşandin. Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmehê jinan di qada çandî û hunerî de kir xwedî deng û reng, bû destpêka ronesanseke nû. Di vê çarçoveyê de hunermenda Opêra Mizgîn Tahir ji Rojnameya me re axivî.

**'Ziman hebûna neteweyî ye'**

Mizgîn Tahir di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ziman mîrat e, exlaq, fikir û çanda civakê ye. Ziman dibe nasnameya neteweyê. Ger em li dîrokê binêrin em ê bibînin bi berdewamiya dabeşkirina xaka Kurdistanê û damezrandina netew-dewletê re, bi formên cuda, hewl dane Kurdan bi awayekî fizîkî qir bikin, xak û neteweya Kurdî ji holê rakin û ziman jî tune bikin. Ziman hebûna neteweyî ye. Gelê Kurd jî yek ji wan gelan e ku her dem bi asîmîlasyon û hewldana tunekirinê re rûbirû maye. Dewletên degirker zimanê Kurdî li welatê xwe qedexe kirin, lê belê vî gelî her dem bi riya ziman û çanda xwe parastina hebûna xwe kiriye. Ji ber wê girîng e em ji zimanê xwe hez bikin û pê kêfxweş bin. Her wiha divê em zimanê xwe ji zimanê biyanî paqij bikin û ziman bi paqijî û dûrî zayendparêziyê biparêzin û ji êrişên ji derve re dûr bigrin. Ev xebat jî pêwîstî bi hewldana hemû aliyan heye û jin jî di rêza pêşî de parastina zimanê xwe yê Kurdî dikin."

**'Divê em parastina çanda xwe ya kevnar bikin'**

Mizgîn da zanîn ku jin bi vîna xwe ya xurt çand û hunera xwe her zindî dike û wiha domand: "Jin herî zêde parastina çand û mîratê dike, huner jî navgîna rizgariya ji zextên jiyanê tê hesibandin, girêdanbûna bi xak û nasnameya xwe di salên dirêj de bi riya stranan vegotine. Di destpêkê de civakê derbasbûna jinên temen mezin di warê huner û stran û gotinan de gotine û sekinandina li ser dikê qebûl nedikir. Lê bi vîna xwe ya xurt û girêdanbûna me bi fikra azadiyê re hişt ku em li pêşiya civakê bisekinin. Me koma xwe birêxistin kir û me îsbat kir ku em dikarin çanda xwe bidin xuyakirin û balê bikşînin ser dozên xwe. Divê em parastina çanda xwe ya kevnar bikin, li hember hêza ku hewl dide me tune bike, hebûna me înkar bike û hewl dide jinan ji cewhera wê dûrxînin bisekinin."

**Jin û Mûzîk**

Mizgîn Tahir di dawiya axaftia xwe de wiha got: "Mûzîka Kurdî ji aliyê jinan ve careke din tê vegotin. Ji ber vê yekê emê her çand û hunera kurdî di nava nifşên nû de zindî bikin. Armanca me ew e ku çanda muzîkê ya gelê Mezopotamyayê digre nava xwe; muzîkên Kurdî, Sûryanî, Erebî û Ermenî dewlemendiya ruhê hevpar derdixin holê. Em ê muzîka gelêrî ya Rojhilata Navîn û muzîka gelêrî ya Kurdî bigihîjênin asta akademiyê. Em girîng dibînin ku gele herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêşketina çandî û hunerî de bigihîjin asta akademîk. Wek tê zanîn ku niha peymangiha hunerê ya bilind ya xweser hatiye vekirin, ev tenê ji bo me serkeftineke. Ez di wê baweriyê de me ku dibistan ji bo jinên ciwan şansek e û dikarin di vî warî de xwe baştir nîşan bidin."

**Bi kamîreya Dilovan Kêfo**



## 'Bila em bê zarok bimînin, lê bê rûmet jiyan nekin'



Ayşa Efendî diyar kir ku li hemberî êrişên dijwar ên li ser xaka wan tên kirin xweparastina civakê erka hemû jinan e û wiha got: "Rêber Apo dibêje 'Jina rêxistinkirî, civaka bi rêxistinkirî ye' ji bo wê pergalên serdest ewqas ji hişmendiya jinên pêşeng ditirsin.**R-2**

## 'QSD'ê zarokên vê axê ne'



Welatiya bajarê Qamişlo Amîne Emîn diyar kir ku dagirkeriya Tirk her roj komkujiyan li ser gel pêk tîne, li hemberî vê dagirkeriyê QSD'ê ax û rûmeta gel diparêze û got, "QSD'ê zarokên me ne û erkê wan ew e ku ax û çavkaniyên jiyanê biparêzin."**R-6**




## Hevpeymana şerma mirovahiyê hevpeymana Mîsaka Millî

Hevpeymana bi navê Mîsaka Millî ya ku axa Kurdistanê ji aliyê dagirkeran ve hatibû dabeşkirin, di daxuyaniya ji 6 madeyan pêk tê ku manîfestoya siyasî ya qaşo Şerê Rizgariya Tirkiyê bû. Di 28'ê Çileya 1920'an de li Stenbolê di civîna dawî ya Parlementa Osmanî de bi yekdengî hate pejirandin û di 17'ê Sibatê de ji raya giştî re hat ragihandin.**R-3**



## 'Pêwîste jin di siberoja Sûriya nû de bi azadî û îradeya xwe bijîn'

Berdevka Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dîler Temo da zanîn ku divê îradeya jin di Sûriya siberojê de bê parastin û jin cihê xwe di hemû qadan de bigre.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1243 29-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# AZADIYA RÊBER APO BINGEHA ÇARESERIYA ROJHILATA NAVÎN E

Rojnamevan Xogir Kemal diyar kir ku bi hevdîtina Partiya DEM'ê ya bi Rêber Apo re 7 xalên bingehîn ji raya giştî re hatin parvekirin ku pêwîste di vê pêvajoyê de çi were kirin. Xalên ku Rêber Apo diyar kirin felsefeya Rêber Apo ya têkoşînê û paradigma wî ya bi hevdûre jiyankirina gelan e. Rêber Apo di hevdîtina xwe de jî diyar kir ku hêza wî heye rewşa şer bizivirîne rewşeke siyasî û qanûnî. **R-4**






## Bircên Amedê

Bircên Amedê bûne nasnameya Amedê. Her bircek xwedî çîrok û dîrokek e. Dema mirov çîrokên bircên Amedê nas bike dikare serpêhatiyên vî bajarî jî nas bike. Ev birc nîşan didin ku Amed çiqas bajarekî kevnar e.**R-7**

HTŞ'ê jî dixwaze jinê terbiye bike!
Nehîr pale R-2


Berxwedana Bendava Tişrînê rastiya bê dawî nîşan da!
Dilyar Cizîrî R-4


"Heyet ji giravê vegeriya?"
Farûk Sakik R-5

Pêwîste Gelê Sûriyê çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bike
Zekî Bedran R-5

# 'Pêwîste jin di siberoja Sûriya nû de bi azadî û îradeya xwe bijîn'

Berdevka Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dîler Temo da zanîn ku divê îradeya jin di Sûriya siberojê de bê parastin û jin cihê xwe di hemû qadan de bigre.

**Birûc Resûl/ Qamişlo**

Bi destpêkirina pêvajoya nû ya Sûriyê re gelek guhartin û veguhartinên bingehîn di hemû Sûriyê de hatin jiyan kirin, yek ji wan jî tunekirina îrade û hebûna jina azad di hemû qadên Leşkerî, civakî, siyasî û hwd bû. Hişmendiya nû ya ku Sûriyê pê tê rêvebirin, xwe dispêre heman mebestê ku îradeya jinê di tu qadên jiyanê de zindî nebe.

Di sedsala 21`emîn de jina ku rojane di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de kêliyên efsanewî dinivîse, muhra xwe li hemû şoreşên di cîhanê de qewimîne xistiye. Têkildarî van mijaran Berdevka Hêzên Ewlekariya Hundirîn ya jinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dîler Temo ji Rojnameya me re axivî.



**Parastina destkeftiyên şoreşê**

Dîler Temo di destpêkê de bal kişand ser rewşa Sûriyê û berxwedana ku tê kirin û wiha got: "Piştê hilweşîna Sîstema Baas ya qirker û tundrew di Sûriyê de, di aliyê ewlekariya Sûriyê de valatiyeke mezin hat jiyankirin, ji ber şane û çeteyên weke DAIŞ`ê û yên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê xwestin ku careke din xwe zindî bikin û êrişî gelek deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bikin, yek ji wan deverên herî girîng jî Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaqê. Ji xwe berxwedana ku niha li wir tê jiyankirin, berxwedaneke ku rojane kêliyên dîrokî têne nivîsandin. Li ser wê esasê niha em di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de kêliyên dîrokî jiyan dikin. Hemû hêzên me çi leşkerî dibe çi jî civakî dibe, li kêlek hêzên QSD`ê di bendava Tişrînê de şer dikin û li ber xwe didin. Da ku em tavahî destkeftiyên şoreşê ji hemû pilan û êrişan biparêzin."

**Di pêşeroja Sûriyê de pêwîste jin bi îradeya xwe were naskirin**

Dîler da zanîn ku sîstema hatiye ser serweriyê, zihniyeta wan ji ya Baas ne cudatire û wiha domand: "Piştî ketina rêjîma Baas û serwerbûna rêveberiya HTŞ`ê li ser Sûriyê, em dibînin ku terz û rêvebirina wan ji hikumeta Baas ne cudatire, di aliyê zihniyetê de hemû dişibin hev ji ber armanca hemû hêzên desthilatdar di asta yekemîn de tunebûna rol û îradeya jin di hikumet û civakê de ye. Li ser wê esasê me dît ku dîsa hebûna jin di asta leşkerî û dîplomasî de qebûl nakin. Bê guman em bi tundî vê yekê qebûl nakin, armanca me weke Bakur û Rojhilatê Sûriyê avakirina Sûriyeke demokratîk ne navendî ye, tê de mafê her kesî bê parastin û jin bi îradeya xwe ya azad jiyan bike. Ev jî yek ji mîras û destkeftiyên şoreşa me ya Rojavayê Kurdistanê ye. ji lewra em jî weke jinên ku li ser xaka Sûriyê jiyan dikin, em ê bi armanca misogerkirina mafê jinê di hemû aliyên jiyanê de kar û xebatê bikin. Em eşkere û vekirî ji hikumeta nû re jî dibêjin ku divê jin cihê xwe di her cihî de bigire."

**`Em ê li pişta hêzên xwe bin`**

Berdevka Hêzên Ewlekariya Hundirîn a jin Dîler Temo di dawiya axaftina xwe de bang li hemû gelê Kurd kir ku tevlî refên xweparastinê bibin û wiha got: "Em di vê pêvajoya girîng de weke hêzên Ewlekariya Hundirîn bang li hemû gel û ciwanên xwe dikin ku tevlî seferberiyê bibin, tevlî refên şer bi QSD, YPG û YPJ`ê re bibin. Ji zarokên 7 salî heya 70 salî em bi yek hêz û îradeyê li pişta hêzên xwe bin. da ku em rê li pêşiya hêzên dagirker yên ku dixwazin destkeftiyên me têkbibin, venekin."

## Ji Pênûsa Jin

### HTŞ`ê jî dixwaze jinê terbiye bike!

**Nehîr Pale**

Li ser rûxandina sîstema Esed û hatine HTŞ`ê 19 roj derbas dibin. Di van 19 rojan de li bajarên Sûriyê û bi taybet li bajarê Şamê, Himis, Heleb û Hema zextekî mezin li jinê tê kirin. Nêzîkatiyên ku hewl didin jinê terbiye bikin, derdikevin holê. Propeganda lixwekirina cil û bergên islamî tê kirin. Heyanî ji destê wan tê dixwazin jinê ji têkoşîna wê dûrbixînin û li malê bidin rûniştandin. Mîna ku bibêjin siyaset ne karê jinê ye, ciyê wê li mutfexê ye.

Li Sûriyê temenê têkoşîna jinê bûye zêdetirî 50 salî, dibe ku destpêkê jina Kurd pêşengtî kir lê niha ev têkoşîn berfereh bûye û ji bo tevayî jinên cîhanê bûye tecrûbeyeke gelekî mezin. Ev tecrûbe gihîştiye asta ku bi sedan jinên Ereb, Ermen, Kurd, Çerkez, Aşûr û Turkmen li hevdû kom bibin. Di van komxebatên xwe de rewşa siyasî ya Sûriyê binirxînin û her tim xwedî nêrîn bin.

Ji nav civaka Dêra Zor, Tebqa û Reqayê jinên ku pêşengtiya xebatê bikin, derdikevin. Bi wêrekî berpirsyartiya xebatê radikin, tevlî hemû çalakiyan dibin, feraseta wan a azadiyê tê guhertin û têdikoşin. Yek ji wan jî şehîd Kerem Ehmed El-Şehab bû. Têkoşîna wê gihîşte asta ku canê xwe feda bike. Jina ku bi destê civaka zayendperest hatiye perçiqandin, êdî bêdeng namîne, daxwaza wan a ku hebûna xwe diyar bikin gelekî li pêş e. Bi riya komîte û meclisên jin jinan birêxistin û perwerde dikin. Civakê birêxistin dikin û pirsgirêkên civakî çareser dikin.

HTŞ`ê bi destpêka hatina xwe re êrîşî jin kir û bi rêbazên hemû hêzên desthilatdar bikartînin û dixwaze dawî li xebatên jin bîn in. Çawa niha li Tirkiyê û Îranê zextekî mezin li jinê tê kirin, tevgerên Islamî dixwazin li Sûriyê jî wê zextê li jinê bikin. Dewleta Tirk a dagirker bi rêbazê girtine hewl dide ku jinê terbiye bike. Dayîkên ku temenê wan 83`ê sale bi sûcê têkiliya wan bi PKK`ê re heye û bûne alîkar hukum li wan dibire û dixe zîndanê. Li Îran jî heman nêzîkatî tê kirin û hukmê darvekirinê li hemû jinên têkoşînvan tê birîn. Çeteyên Tirkiyê li bajarên Sûriyê yên dagirkirî heman rêbazan li hemberî jin didin bikar anîn.

Ji nêzîkatiyên HTŞ`ê yên ji jinê re tê fêmkirin ku ew ê cî nedin jinê û mîna dewleta Tirk û Îranê nêzî jinê bibin. Ew jî wê zayendperestî weke pirsgirêk nebînin û di bin navê ola Islamê de jinê girê bidin.

Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Meclisa Kombûna Jin a Zenûbiya, Kongra Star û Meclisa Jin a Sûriyê di vê pêvajoyê de ji berê zêdetir têkoşîna xwe xurt kirin. Hewl didin ku xwe bighînin hemû jinên Sûriyê. Ji bo jin tevlî kongreya netewî ya Sûriyê bibin û di nivîsandina destûra Sûriyê de ciyê xwe bigrin ji hemû aliyan ve xwe birêxistin dikin.

Li Sûriyê ev pêvajoya nû ya ku destpêkiriye ji bo jin firsetekî mezine, çiqasî xwe birêxistin bike wê ew qasî xwe biparêze û di xebatên xwe de bighîje destkeftiyên mezin. Jina Sûriyê dikare ji hemû jinên cîhanê re pêşengtî bike û bibe mînak.

# 'Bila em bê zarok bimînin, lê bê rûmet jiyan nekin'

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

**Ayşa Efendî diyar kir ku li hemberî êrişên dijwar ên li ser xaka wan tên kirin xweparastina civakê erka hemû jinan e û wiha got: "Rêber Apo dibêje 'Jina rêxistinkirî, civaka bi rêxistinkirî ye' ji bo wê pergalên serdest ewqas ji hişmendiya jinên pêşeng ditirsin.**

Li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê her diçe metirsî û gef zêdetir dibin. Rojane bi êrişên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyan wê li ser destkeftiyên gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê têne kirin, dixwazin bi van êrişan re metirsiyê di nava gel de çêbikin. Gel jî ji bo parastina xaka xwe xwedî helwest e û êrişên ku rojane tên kirin, şermezar dikin. Metirsiya pergalên serdest li hemberî pêşengiya jinan e, û armanca wê ew e ku jin û civakê bê bandor bike.

Têkildarî êrişên dawî û li hemberî êrişan pêwîste ku xweparastina civakê di kîjan astê de be, Rêvebira Komîteya Insiyatîfa Azadiya Rêber Apo Ayişa Efendî ji Rojnemeya me re axivî.

**'Em ji derveyî azadiyê tiştekî din napejirînin'**

Ayişa Efendî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Şerê li Bendava Tişrînê dewam dike. Gelê me bi karwanên ku çûn bendava Tişrînê, ji bo piştgirî bidin şervanên QSD'ê, hemû bi awayekî rêxistinkirî diçin bendava Tişrînê û di heman demê de parastina xwe ya hundirîn didomînin. Heta dawiyê li Bendava Tişrînê emê li kêleka şervanên xwe bin. Em mil bi mil bi hêzên YPG, YPJ û QSD'ê re alîkar in. Em jin li ser felsefeya Rêber Apo hatine perwerdekirin û em ê heta dawiyê li ser felsefeya Rêber Apo têbikoşin û bi rihê şerê gelê şoreşgerî xwe birêxistin û perwerde bikin. Heta rojek ji temenê me bimîne em ê çeka şehîdan li erdê nehêlin. Di wexteke ku hemû cîhan û dewlet hewl didin jinan qir bikin de divê jin bersivê bidin wan û pergala xwe ya parastinê xurtir bikin. Em ji derveyî azadiyê tiştekî din napejirînin. Pêwîst e jin koletiyê qebûl nekin û serî netewînin."

**'Tirsa pergalên serdest ji sîstema Reveberiya Xweser heya'**

Ayişa da zanîn ku sîstema Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî van êrişên dijwar, xweparastin û şerê gelê şoreşgerî divê bi pêş bikeve. Ji bo parastina vê civakê li hemberî van êrişan erka yekem dikeve ser milên jinan. Ev destkeftiyên dîrokî yên bi xwîna hezaran şehîdan hatine bidestxistin, divê ji aliyê me jinan ve werin parastin. Êrişên li ser projeya Rêveberiya Xweser û neteweya demokratîk a ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdibin bi armanca wekhevî û demokrasiyê ye. Pergala ku îro me li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ava kiriye, bandora xwe li tevahî gelên Rojhilata Navîn kiriye. Metirsiya pergalên serdest di serî de li hemberî vê heye û dizanin ku ev pergal li dijî berjewendiyên wan e. Bê guman di hemû êrişan de destpêkê jin hedef tên girtin, Rêber Apo dibêje 'Jina rêxistinkirî, civaka bi rêxistinkirî ye' ji bo wê pergalên serdest evqas ji hişmendiya jinên pêşeng ditirsin. Em rojane dibin şahidên vê rastiyê, di hemû qadan de jinên ku pêşengî ji civakê re dikin destpêkê êriş li ser wan tê kirin."

**'Ji bo parastina xaka xwe, emê xwe û zarokên xwe feda bikin'**

Rêvebira Komîteya Insiyatîfa Azadiya Rêber Apo Ayişa Efendî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em ê xwedî li keda Rêber Apo derkevin û pêwîst e hemû jin xwedî li vê kedê derkevin. Ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û azadiya xwe divê em têkoşîn û berxwedana xwe bilind bikin. Heta azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk neyê, azadiya me pêk nayê. Pêwîst e em di vê xalê de bawer bin. Divê em vê salê bikin sala azadiya Rêber Apo û hemû jinan. Ji aliyê din ve jî divê em hêza xweparastina xwe xurt bikin û bi hev re civaka xwe biparêzin. Ji bo vê jî pêwîstiya me bi yekîtiyê heye û pêşengê vêya jî, jin in. Her wiha dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê, bi rêbazên şerê taybet diwazin metirsiyê di nava civakê de ava bikin û gelan ji ser xaka wan bidin koçberkirin. Lê ev civaka ku bi salan e rastî êriş û qirkirinan tê êdî dijminê xwe baş nas kiriye. Ev xaka ku bi xwîna şehîdan hatiye bidestxistin wê wisa rehet ji çeteyan re nemîne. Em ê heta dawî parastina xaka xwe bikin û li kêleka şervanên ku ji bo parastina vî gelî şer dikin bisekinin. Dibe ku em bê zarok bimînin, lê bila em bê rumet jiyan nekin."





# Bircên Amedê

Bircên Amedê bûne nasnameya Amedê. Her bircek xwedî çîrok û dîrokek e. Dema mirov çîrokên bircên Amedê nas bike dikare serpêhatiyên vî bajarî jî nas bike. Ev birc nîşan didin ku Amed çiqas bajarekî kevnar e.



**Navenda Nûçeyan**

Amed, bi bircên xwe û bedena xwe tê naskirin. Bedena Amedê bi bircan xeml û xêza xwe neqişandiye û xwe ji dijminan parastiye. Her bircek, ji bo bedema Amedê bûye mertal û piştekek. Li ser Bedena Amedê di serdemên cûda de 82 birc hatine avakirin. Gelek ji wan gilover in. Hin ji wan çarqozî û pirqozî ne. Hin ji wan 2 qat, hin ji wan jî 3 qat in. Qatê jêr wekî embar ango depo hatiye bikaranîn. Qatê jor jî ji bo leşkeriyê hatiye bikaranîn. Bircên ku li hemberî êrîşên şer û xwezayê li ser lingan mane gelek jê rastî tarîbatê mezin hatine. Her çiqas ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û Wezareta Çandê ve hinek ji wan hatine restorekirin jî dîsa li benda rastorasyonek nû ne.

Gelek bircên Amedê çîrok li ser wan hatine gotin. Bi çîrok û serpêhatiyên xwe di nava rûpelên dîrokê de hatine parastin. Di nava 82 bircan de yên herî zêde têne naskirin, Birca Bilind ango Birca Ben û Sen, Birca 7 xwişk û bira, Birca Bizinê, Birca Merwanî, Birca Keça Qral, û Birca Tupişk têne naskirin.

**Birca Benûsen**

Birca Bilind ango Ben û Sen li newala Çemê Dîcleyê dinere. Parastina wê hêsan e. Birc 4 qozî ye. Bircên dora wê dûrî hev in. Li gorî kîtabeyan tê zanîn ku berhemê Artûkiyan e. Di navbera salên 1183- 1232'an de di dema Melik-el Salîh ebû'l-feth Mahmût ve hatiye çêkirin. Mîmarê wê Cafer kurê Brahîm e. Li ser bircê bi tevahî 6 motifê şêr hatine kolandin. Motifên şêran bi tac û baskin. Teriya şêra wekî serê ejderha hatiye çêkirin. Serê şêran, mîna serê însanan hatiye çêkirin. Ev fîgurên şêran, fîgurê şêrên li pêş Pîramîtên Misrê yê serî mirov û laşê wî şêr tîne hijê mirovan. Li aliyê din, li ser vê bircê qertelê du serî heye. Baskê vî qertelê du serî de 6 per dirêj dibin. Gelek motîfên şêr û qertel xurimîne û şikestine. Ji ber ku Qertelê du serî ji ailyê mirovan ve pir hatiye hezkirin, li gelek sazî û rêxistinên wekî Şaredariya Amedê, Zanîngeha Dîcle û gelek saziyên din wekî sembol bikar anîne.

**Birca 7 xwişk û bira**

Li aliyê başûrê Bedena Amedê hatiye avakirin. Ev birc jî wekî Birca Bilind, di sala 1183-1232'an de ji aliyê Artûkiyan ve hatiye avakirin. Ji bo Hikûmranê Artûkiyan Melîk Salîh ji hêla Mîmar Kurê Cafer ve hatiye avakirin. Ev birca grover, bi bilindbûn û mezinbûna xwe heybete. Li ser vê bircê fîgurê qertelê du serî, şêrê bi bask, şêr sewalên din hatine kolandin. Li aliyê din Kîtabeya li ser sînga vê bircê hatiye nivîsandin, wekî mirov bazinekî nexşandî têke gerdena vê bircê. Mirov li hemberî xeml û xêza wê matmayî dimîne. Ev birc jî wekî Birca Bilind ji binî heta jor bi avayekî estetîk aheng hatiye neqişandin. Ji kîtebeya ku wekî gerdenekê beşna pêçaye heta fîgurên heywanan rengê huner û ostatiyek mezin tê xuyakirin. Ev kîtabeya kaligrafik ku wecê bircê dike du parçe; li ser kevirên fireh wekî dantênê bi moriyan hatiye xemilandin. Dîsa li ser vê bircê jî fîgurên şêrê bi bask û sermirov ku teriya wî serê ejderhaye hatiye bicih kirin. Ev fîgurê şêr ku li cem û rastê wecê bircê hatine çêkirin, li binya bazinê kîtabeyê hatine bicih kirin. Dîsa li binya bazinê kîtabeyê û orta herdu şêran fîgurê qertelê du serî hatiye kolandin. Di van nexşe û fîgurên hatine kolandin de jî tê xuyakirin ku wê demê gelek qîmet dane huner û çandê. Her wiha hatiye xwestin ku bi van fîgur û nexşeyan mezinbûn û hêza şaristaniyên xwe nişanî cîhanê bidin.

Li gorî çîrokan, rojekê ji rojan, qralê wê demê pêşbirgekê amade dike. Qral, dixwaze du bircên pir bilind û xweşik bêne avakirin. Li ser daxwaza qral, hosteyek û şagirtek xwe pêşniyar dikin. Hoste di vê pêşbirgê dixwaze dîsa hunerên xwe rê cîhanê bide. Şagirt jî dixwaze bi vê derfeta ku ketiye destê wî ostayê xwe derbas bike. Piştî demekê hoste Birca 7 xwişk û bira, şagirt jî Birca Bilind bi dawî dike. Piştî ku ev herdu birc dibe dawiya xeyalan.


Li gorî rîvayetek din, rojek ji rojan dijmin dora bajêr dorpêç dike. Piştî şerê roj û mehan, dijmin hemû bajêr dagir dike, lê tenê Birca 7 xwişk û bira bidest naxe. Qralê dijmin ji bo lihevhatinê nameyekê ji 7 birayan re dişîne. Dixwazin 7 bira teslîm bigire. 7 Bira jî, şert û mercên teslîmbûna xwe ji qral re radigihîne. 7 bira dixwazin qral bi xwe were wan teslîm bigire. Li ser vê daxwaza 7 birayan, qral daxwazê wan qebûl dike û li gel fermandarên xwe diçe birca 7 birayan.

Pişti qral û fermandarên xwe dikevin hundir bircê teqîn pêk tê. Çawa ku dikevin depoyê teqîn çêdibe. 7 birayan depoya barûtê teqandibûn. Bi teqînê re qral, fermandarên wî û 7 bira dimirin.

**Birca Keçikê**

Li rojhilata Deriyê Mêrdîn, li ser zinarekî hatiye avakirin. Di nava bircan de birca herî kevn û mezin e. Her çiqas dîroka wê baş neyê zanîn jî li nivîsên hatine dîtin tê gotin ku di sala 1223'yan de ji aliyê Kurê Mervaniyan ve hatiye restorekirin. Ev birca ku ji 11 kemeran pêk tê wekî perestgeh jî hatiye bikaranîn. Tê gotin ku tunela di bin vê bircê re derbasî derveyî bircê dibe bi betonê hatiye girtin. Ev birca ji aliyê Xoriyan ve hatiye avakirin Berî Zayinê di sala 349'an de ji aliyê Împaratorê Roma Konstandinos ve hat restorekirin.

Herî dawî di sala 2002'yan de ji aliyê Wezareta Çandê ve ji nû ve hate restorekirin û deriyê xwe ji turîzmê re vekir.




**Birca Nûrê**

Li rex Birca 7 xwişk û birayan hatiye avakirin. Ev birc wekî berhemên Selçûqiyan ya herî xweşik tê zanîn. Di navbera salên 1085-1183'an de hatiye avakirin. Ji aliyê Mîmar Selamî kurê Muhamedê Rihayî ve hatiye çêkirin. Kîtabeya li ser vê bircê bi nivîsa Kûfi (Nebatî) hatiye nivîsandin. Li ser dîwarên vê bircê, sûretên hesp, şêr, xezal û fîgurên jinê hatine nexşandin. Bi nivîs û fîgurên heywanan birca herî xweşik û dewlemend e. Di navbera kîtabeyê de bizina qoçdirêj, ahenga bircê xweşiktir dike. Dîsa hespê ku biçargaviyan dibeze yê di nava kîtabeyê de bi cih kirine, pêşketina peykeriyê û di aliyê anatomiyê de çavderîyên xurt dide nîşan. Fîgurê kevokê ku li çepê kîtabeyê hatiye çêkirin wekî baskê qertelê du serî 6 per jê diherin. Li biniya vê kîtabeyê peykerê jinek tazî, porkinik ku çarmêgê rûniştiye heye. Li aliyê rastê dîsa motifê kevokê û li binya kevokê jî peykerê jina tazî cih digre. Di serdema antîk de peykerên jinên tazî yên wekî Kîbele, sembola bereket û zedahiyê ye. Li aliyê rastê yê kîtabeyê peykerê şêr hîn berbiçav e. Li milê çepê peykerê çûkekî koştxur ku cûreyê wî nayê zanîn heye. Di vî peykere çûkê ku Seyda xwe perçe kiriye de hêz û xurtbûnê dide nîşan.

**Birca Deriyê Çiyê**

Hemû şaristan û hikûmdarên ku di Amedê re derbas bûne, li ser diwarê Birca Deriyê Çiyê kîtabe, nexş, işaret û sembolên xwe bi cih kirine. Li gelek cihan fîgur û peykerên heywanên cûda cûda û gihayên cûda cûda hatine çêkirin. Ji aliyê kîtabe û nexşeyan ve birca herî dewlemend e.

**Nivîs û figure**

Dema ku mirov li ser tablet û nivîsên birc û bedenên Amedê dinere, dibîne ku hemû çand û keda mirovahiyê li vir li hev civiyaye. Her civakekê bi tablet, nivîs û fîgurên xwe kevneşopiyan xwe li pey xwe hiştiye.

Lê belê ji ber birc û beden gelek car hatiye hilweşandin û nû kirin, gelek ji van tablet û nivîsên ku çand û dîroka van civakan gihandiye heta roja îro wenda bûne. Tablet, bi piranî ji fikr û nerînên hostayê ku birc û beden lêkirine pêk tê. Fîgur jî sembol û remzê baweriya civaka wê demê û çanda wê demê tîne ziman. Fîgur û tabletên Roma û Bîzansiyan bi piranî li Deriyê Mêrdîn tê dîtin. Li gorî lêkolînan di nava yek ji van tabletan de wiha tê nivîsandin: "Împaratora ku têk naçe, di pêşengî rêveberiya Qehreman Velantitianus û Grantianus de di bingeha dewletbûyinê de hate avakirin.

Hin nivîs û tabletên dema Abasiyan jî li navbera Deriyê Mêrdîn û Deriyê Çiyê tê dîtin. Di van nivisan de jî navê kesê ku endezyarî li ser vê axê kiriye tê nivîsandin.

Di serdema Merwaniyan de Amet dibe qada nûkirin û restorasyonên. Merwanî bi piranî li ser avakiran binc, bend û piran rawestiyan. Di vê demê de welatiyên vir di nava hemûn û aramiyê de jiyan. Vê demê Amed dibe mesken û warê zanist, zanyar, endezyar û çandê. Mirov, li ser restorasyona birc û bedenê de li gelek nivîsên Mervaniyan rast tê.

Mescîda Mervaniyan ku li ser Deriyê Çiyê ye, îro wekî galeriya hunerê xizmetê dide. Di nivisa hundirê derî de nivîs wiha hatiye nivîsandin: "Mescîdê xwedê tenê ji aliyê kesên ku nimêj dikin, rojî digirin, zekat didin û kesên ji xwedê ditirsin ve tê tijekirin.

Nivîs û tabletên ku ji dema Selçûqiyan de li ser Birca Nûr û Findiq hatiye nivîsandin wiha tê gotin: "Sultanê mezin, şahê şahan, Sûltanê welatê xwedê. Mezinê ol, welat û cîhanê. Kurê Alparslan Melîkşah, emir kiriye ku ji malê xew çêke.

Di serdema Eyyubiyan de birc seranser ji nû ve têne nûkirin. Li ser bircên dora Deriyê Çiyê de tabletên Eyûbiyan zêde hene. Li van tabletan wiha tê nivîsandin: "Bila xwediyê mezinaniyê Sûltan Melîk kurê kamîl, Şahê musliman û îslamê, stêrka cîhanê Ebu'l-fet Eyup Melîk Salîh Sûltan Ezîz be."

**Fîgurên li ser bircan nivisandî**

Gelek fîgurên li ser birc û bedena Amedê hatine nivîsandin li benda lêkolîn û vegotina zanistîne. Ev fîgurên sembolîk, çand û baweriya wê demê dide nîşan. Fîgurên ku li ser van bircan hatine çêkirin şopa çand û baweriyên şaristaniyên ku di rûpelê dîrokê de hatine li vir bûne mêvan hene.

# ‘QSD’ê zarokên vê axê ne’

Welatiya bajarê Qamişlo Amîne Emîn diyar kir ku dagirkeriya Tirk her roj komkujiyan li ser gel pêk tîne, li hemberî vê dagirkeriyê QSD’ê ax û rûmeta gel diparêze û got, “QSD’ê zarokên me ne û erkê wan ew e ku ax û çavkaniyên jiyanê biparêzin.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne nû ne, lê belê bi armanca dagirkirina beşên din ji axa herêmê, rojane êrişî herêmê dike. QSD’ê jî li hemberî êrişên wan li ber xwe dide û nahêle ew bigihêjin armanca xwe. Gelên vê xakê jî êdî ji aliyê leşkerî, siyasî, rêveberî ve xwe bi rêxistin kirine û ji hemû rewşan re amade ne. Ev gel mîna berê bê îdeolojî, bê rêxistin, bê bawerî, bêhêz nîne. Civakê êdî xwe ji aliyê fikir, paradîgma, rêveberî, bawerî, îrade û leşkerî ve xwe bi rêxistin kiriye, bûye xwedî hêze. Li dijî êrişên dewleta Tirk û çeteyên wê ku ev zêdetirî 20 rojan e li Bendava Tişrîn û pira Qereqozaqê rû dide, bi hezaran gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê destekdayîn û piştevaniya xwe ji bo şervanên QSD, YPJ û YPG’ê nîşan dan. Di heman demê de rojane berê xwe didin bendavê da ku êriş bê rawestandin û aramî êdî pêk were. Herwiha bi saya berxwedana dîrokî ya ku QSD, YPJ û YPG’ê li bendava Tişrînê didin meşandin û tevî hemû şer û pevçûnên giran jî heta niha dewleta Tirk û çeteyên wê nikarin encamên ku dixwestin bi dest bêxin.

**Girîngiya bendava Tişrînê**



Bendava Tişrînê li Başûrê Kobanê dikeve, yek ji cihên herî stratejîk li Bakurê Sûriyê ye. Bendava Tişrînê di sala 1999’an de ser çemê Feratê hate avakirin. Di sala 2015’an ji aliyê HSD’ê ve ji çeteyên DAIŞ’ê hate rêzgarkirin. Ev bendav elektrîkê dide piranîya parêzgehên Heleb û Hesekê. Ew beşekî mezin eletrîkê dide Bakur û Rojhilatê Sûriyê û ji aliyekê din ve bûye çavkanîya ava vexwarinê û avdana zeviyên li wê herêmê. Zêdeyî 400 hezar kes li Kantona Feratê ji çend aliyan ve sûdê ji bendava Tişrînê dibînin. Di warê pîşesazî de, dora 400 kargeh li vê deverê hene, jiyana gelek kesan bi van kargehan ve girêdayî ye, lewra eger rewşa ewlekarî li bendava Tişrînê têk biçe, ew ê gelek kes ziyaneke rasterast di encama wê rewşê de bibîne. Dewleta Tirk a dagirker dixwaze bi kontrolkirina bendava Tişrînê û pira Qereqozaqê Kobanê bike armanc. Ew diwaze Kobanê ji aliyê aborî û ewlekarî ve bixeniqîne.

Derbarê hevgirtina gelên herêmê bi QSD`ê re, welatiya bajarê Qamişlo Amîne Emîn ji rojnameya me re axivî.

Amîne Emîn diyar kir ku cîhan li hemberî komkujiyên dewleta Tirk pêk tîne çavê xwe girtî ye û got: “Bi destê dewleta Tirk a dagirker komkujî pêk tên. Erdogan bi serê xwe her tiştî li hemberî gelê kurd dike, bajar, binesazî, kargeh, av û elektirîka me wêran dike, komkujiyan li ser jin û zarokên me pêk tîne. Lê bile dewleta Tirk bi taybet Erdogan bizane ku gelê kurd ne gelê berê ye, ne gengaze ku em piştî ewqas destkeftî gavê bi paş de bavêjin, çi ji me bê xwestin em ê bikin û heya dawî li pişta QSD’ê, YPG û YPJ’ê bin. Herwiha wê hemû gelên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin bi kurd, Suriyan, Ermen, Çerkez û Erebê xwe, li hemberî tang û topên dewleta Tirk li ber xwe bidin. Niha jî dewleta Tirk û çeteyên wê bi hovitî bendava Tişrînê bombebaran dike, heger ev bendav bê hilweşandin wê karaset pêk bên, lê desteserkirina bendava Tişrînê ji Erdogan û xwînmijên weke wî re, xweneke gelekî zehmet e.”

**‘QSD’ê zarokên vê axê ne’**

Amîne Emîn anî ziman ku QSD’ê zarokên wan ne û wiha got: “QSD’ê wê axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê biparêze. Ew jinên kezî sor ku çavên wan mîna çavê xezalan



ne, xwe kirine mertalên zindî û li hemberî çeteyên herî hov şer û berxwedaniyê dikin. Bendava Tişrînê “bendava şehîdan û berxwedanê ye”, di şexsê van şehîdan de, em hemû şehîdên azadiya Kurdistanê bi bîr tînin û bejna xwe li hemberî wan ditewînin. Gelê kurd di rojên dîrokî de derbas dibin û ev qonaxeke hestiyar û dîrokî ye ji bo hemû gelên Kurdistanê, bi taybet ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Van pêşketinên dawî li Kurdistanê pêk tên, ji bo me cihê kêfxweşiyê ye. Me sedsal li pey xwe hişt ku em leşkerê xelkê bûn, lê niha em ê leşkerê xwe bin, em tev QSD’ê, YPG û YPJ’ê ne. Destkeftî û pêşketinên ku li Kurdistanê, bi taybet li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk hatine bi saya xwîna şehîdan e. Rêber Apo dibêje: “Her şehîdek parçek ji canê min e” û vê jî dibêje: “Tu welat û tu gelî, welatê xwe bê xwîn çênekiriye” ji bo wê heta dawî çi ji me bê xwestin em ê bikin. Wê sala 2025’an bibe sala kurdan û hemû gelan.”

**‘Em ne şerxwazin em aştîxwazin’**

Amîne Emîn axaftina xwe wiha qedand: “Ez bang li mafê mirovan û netewên yekbûyî dikim, bile ji xewa xevletê şiyar bin, çima çavê xwe ji van kumkujiyan digrin. Li her bajarekî me, dagirkeriya Tirk komkujiyan pêk tîne. Efrînê, Kobanê, Girê Spî û Serêkaniyê bajarê me ne Tenê daxwaza gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê aştî û demokrasî pêk were. Ji ber em ne şerxwazin, em aştîxwazin, lewra em bang li hemû hêzên navdewletî dikin ku van kumkujiyên ku têne meşandin rawestîne.”

# Ferhan Silêman: Armanca me xilaskirina jiyana birîndaran e

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Rêveberê odeya rewşa lezgîn a Heyva Sor a Kurd Ferhan Silêman diyar kir dema ku Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihand Heyva Sor a Kurd kete nava liv û tevgerê û got: “Ji bo ku em jiyana birîndaran xilas bikin bi hemû alavên xwe yên tenduristî berê xwe dane Bendava Tişrînê.”**

Saziya alîkariyê ya Heyva Sora ya Kurd ku bi armanca çareserkirina pirsgirêkên gel di 2012’an de li Rojava hate avakirin û li gorî derfetên kêm hewil da ku pêdiviyên tenduristiyê yên lezgîn yên welatiyên Rojava dabîn bike. Heyva Sor a Kurd di demeke kurt de bû mezintirîn destgeha alîkariya tenduristiyê ya lezgîn di tevahiya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de. Herwiha di vê rewşa dawî ya herêmê de û bi taybet dema ku Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihanid Heyva Sor a Kurd li kêleka Rêveberiya Xweser gelek kar û xebat dane meşandin. Hem ji alîkî ve dema ku koçberên Efrînê hatin herêmên Rêveberiya



Xweser ên bi ewle Heyva Sor a Kurd destek dan wan û alîkariya wan ji aliyê tenduristî ve kir. Di heman demê de divê rewşa niha yaku herêm têre derbas dibe û bi taybet berxwedana ku li Bendava Tişrînê niha tê meşandin, Heyva Sor a Kurd ji bo ku rewşa birîndaran bişopîne û tedawiya wan bike bi hemû alavên xwe yên tenduristiyê berê xwe dane Bendava Tişrînê. Lê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve du ambulansên wan hatin hedefgiritin.

Di derbarê kar û xebatên Heyva Sor a Kurd di vê rewşa dawî de Rêveberê odeya rewşa lezgîn a Heyva Sor a Kurd Ferhan Silêman ji Rojnameya me re axivî.

**‘Karê me rewşa lezgîn e’**

Ferhan Silêman anî ziman ku karê Heyva Sor a Kurd her tim rewşa lezgîn e û wiha got: “ Dema ku Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihand em weke Heyva Sor a Kurd bi hemû alavên xwe yên tenduristiyê ketin tevgerê û bi erkê xwe rabûn. Herwiha dema ku şer li cihekî çêdibe em ji aliyê sivîlan ve mudaxele dikin û em birîndaran radikin cihekî biewle ji bo ku tedawiyên lezgîn ji bo wan bikin. Di heman demê de karê me karekî mirovî ye û armanca me xilaskirina jiyana birîndara ye, dema ku gel berê xwe dan Bendava Tişrînê ew ji aliyê balafirên dewleta Tirk a dagirker ve hatin hedefgirtin û di encamê de 26 kes şehîd û gelek kes birîndarbûn. Herwiha di vê demê de û ji bo ku em jiyana birîndaran xilas bikin, me berê xwe da Bendava Tişrînê, lê mixabin ji aliyê dagirkeriya Tirk ve di navabera bajarê Reqayê û Cirniyê de ambulansa me hate hedefgirtin û di encamê de endamekî me şehîd bû û yek jî bi giranî birîndar bû.”

**‘Pêwîste rê li ber hedefgirtina ambulansên tenduristiyê were girtin’**

Rêveberê odeya rewşa lezgîn Ferhan Silêman da zanîn ku ji bilî ambulansên Heyva Sor a Kurd, sê ambulansên Desteya Tenduristiyê



jî ji aliyên dagirkeriya Tirk ve hatin hedefgirtin û gotina xwe wiha bi dawî kir: “Di encamê de sê endamên Desteya Tenduristiyê şehîd bûn û şeş endam jî birîndarbûn. Herwiha dema ku ambulansên me tên hedefgirtin wê demê astengiyeke mezin li pêşiya karê me derdikeve, ji ber ku endamên me nema dikarin bi aramî bi karê xwe rabin. Pêwîste rêxistinên navnetewî û mafên mirovan rê li ber hedefgirtina ambulasên tenduristiyê bigirin. Di heman demê de em weke Heyva Sor a Kurd banga me ji rêxistinên navnetewî û mafê mirovan re heye ku bi erkê xwe rabin û nehêlin ku ambulansên tenduristiyê werin hedefgirtin û rê li ber êrişên dagirkeriya Tirk bigirin.”



# Hevpeymana şerma mirovahiyê hevpeymana Mîsaka Millî

Hevpeymana bi navê Mîsaka Millî ya ku axa Kurdistanê ji aliyê dagirkeran ve hatibû dabeşkirin, di daxuyaniya ji 6 madeyan pêk tê ku manîfestoya siyasî ya qaşo Şerê Rizgariya Tirkiyê bû. Di 28’ê Çileya 1920’an de li Stenbolê di civîna dawî ya Parlementa Osmanî de bi yekdengî hate pejirandin û di 17’ê Sibatê de ji raya giştî re hat ragihandin.

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Beriya her tiştî Mîsakê Millî tê wateya “Sonda Neteweyî”. Di dema xwe de bi navê ‘Ehd-i Millî’ an jî ‘Peymana Millî’ jî hatiye naskirin. Ya duduyan, di 28’ê Çileya 1920’an de di rûniştina nefermî ya Parlamentoya Osmanî ya dawî de, danezana Peymana Neteweyî hat qebûlkirin û di 17’ê Sibata 1920’an de ji meclîsên cîhanê re hat ragihandin. Bi tevahî 6 made hene û ji bo 6 stûnên baweriyê jî tê gotin ‘Eqîdeya Têkoşîna Neteweyî.


Xaleke din a ku divê were zanîn jî ev e ku ji bilî vê yekê ku Şerê Rizgariyê li Anatolya û Trakyayê bi hemû leza xwe berdewam dikir, di Konferansa Aştiyê ya Parîsê de ku di 18’ê Çileya 1919’an de dest pê kiribû, Danezana Pakta Neteweyî hat dayîn. Demeke ku qala pêşeroja Împaratoriya Osmanî dihat nîqaşkirin, ku bi perçebûna Împaratoriya Osmanî re wê tengav û Stenbol ji destê Tirkan bên standin ku dewleteke dagîrker şertên aştiyê daniye pêş. Kurd bi gelên herêmê re weke bendeke bêserûber li pêşiya projeya berfirehkirina Erdogan a ji nû ve vejandina Împeratoriya Osmanî ya nû û xêzkirina nexşeyên qaşo “Mîsakê Millî” rawestiyan. Erdogan îro bi mazûvaniya konferansa tirkmenan a li Sûriye û Iraqê ve dawiyê serî li hîleyên din dide û wê nexşeyekê nîşan da ku beşeke mezin ji Sûriyê û Iraqê, ku tê de Kurd, Ereb, Suryan, Asûrî, Ermen, Tirkmen û neteweyên din lê dijîn, nîşan da, ev yek nîşan dide ku niyeta Tirkiyê berdewam dike ku herêmê bikişîne nav rewşeke bêdawî şer. Bi nêzîkbûna dawîbûna Peymana Lozanê ya xedar re, xeyalên Tirkan bi ji nû ve danasîna Mîsaka Millî û bipêşxistina Mîsakê Millî ku gelên talankirî û axa xwe winda kirine hêrs dike. Rejîma Tirk ji bo têkçûyina dîroka Osmaniyan beriya 100 saliya peymana Lozanê, ji bo vejandina vê peymanê ji bo xwe bi zagonî dimeşe.

**Pejirandina qaşo Peymana Neteweyî a Mîsakê Millî**

Danezana Pakta Neteweyî piştî ku di 17’ê Sibata 1920’an de li Parlementê hat xwendin bi pêşniyara Parlementerê Edîrneyê yê w,ê demê Mehmet Şeref Aykut hat pejirandin. Şeref Aykut pêşniyara xwe wiha tîne ziman: “Pêşniyara min ew e ku Peymana Netewî ji hemû parlementoyên cîhanê û çapemeniya welat û çapemeniya cîhanê re were ragihandin û bi tercîhî were gotûbêjkirin... Dema ku miletê me ji hilbijartina me bişîne vir. ofîsên, wekî erka me ya yekem, rûmeta nûnertiya xwe didin me, rojên geş ên berê, ku mafên herî bêguneh diparêzin, ku mafê jiyan û rûmetê nîşan didin, Wî dixwest ku em vê Peymana Neteweyî ragihînin, ku nîşan dide ku mafê me heye ku em li ser pêşerojê bifikirin û heke hewce bike wekî hemî endamên milet xetera mirinê heye... Em mafê eşkere, mafê jiyanê, ku materyalê me dixwazin. û hebûna giyanî ji me re peyda dike. Em tiştekî din naxwazin. Ya ku ez ê niha bixwînim Peymana Millî ye. Sonda milet e. Miletê Tirk an wê şert û mercên vê sondê bi cih bîne, an jî li ber dîrokê bi rûmet winda bibe. Lê em ê nebin kole, ezbenî diyar e ev daxuyaniya meclîsê gotineke welatparêziyê ye. Ev peyama min hem li dijî sultan hem jî li dijî hêzên dagirker derketinek e”

**Plana dewleta Tirk a ji nû ve zindîkirina sînorên Peymana Neteweyî**

Dewleta Tirk planên xwe yên tinekirina destkeftiyên Kurdan û pêkanîna xewna vejandina Peymana Neteweyî zêde dike. Dewleta Tirk a ku bi xeta xiyanetê ya PDK’ê ve êrîşên xwe yên li ser her çar parçeyên Kurdistanê zêde kiriye, li Başûrê Kurdistanê jî, li dijî hikûmeta Herêma Kurdistanê bi hikûmeta Iraqê re peymanên cuda çêdike. Li ser vê bingehê lihevkirin çêbûn, PDK bi xwe jî di nav de dewleta Tirk her tim polîtîkayên xwe yên dijberiyê dimeşîne û Rêveberiya Xweser a Kurd li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike armanc. Bi peymana Osmanî û Îranê. Dema ku sînorên navborî di sedsala 17 de hatin xêzkirin, dewleta Tirk bû, bi van polîtîkayên qirkirinê yên ku rêveberiya Terakkî dabûn destpêkirin, Kurdistan girt û hewildan kirin ku ji bona berjewendiyên xwe bikar bîne. Siyaseta desteserkirina Kurdistanê bi navê Peymana Netewî hate binavkirin. Di parlementoya dawî ya Osmaniyan de ku di 28’ê Çileya 1920’an de li Stenbolê pêk hat. Plana dagirkirina Kurdistanê bi yekdengî hate qebûlkirin û di 17’ê Sibatê de ji raya giştî re hate ragihandin. Piştî ku ji raya giştî




re hat ragihandin ku dewleta Tirk dixwaze Kurdistanê parçe bike. Bi îmzekirina peymana bi Fransa-Brîtanya û piştre bi Amerîka û Yekîtîya Sovyetan re, ev yek bû sedem ku beşên Kurdistanê li gor berjewendîyên xwe belav bikin. Di wê demê de Bakurê Sûriyê firot Fransiyan, Mûsil-Kerkûk firot Îngilîzan. Di vir de armanc ew bû ku kurdan belav bikin, perçe bikin û pêşî li azadiya wan bigirin.

**Fêmkirin û gotinên Rêber Apo ji bo Doza Demokrasiyê û dijî hevpeymana Mîsakê Millî**

Ev diyare ku perçebûna Kurdistanê li ser bingeha Iraqê binpêkirina eşkere ya Peymana Neteweyî ye. Ev pêşketin ji aliyê gel ve bi hêrs tê pêşwazî kirin. Peymana Mûsil-Kerkûkê ku di 5’ê Pûşber a 1926’an de bi Îngilîzan re hat îmzekirin jî ji bo Kurdan destpêka qirkirinê ye. Rêber Apo li ser vê mijarê dibêje: “Berevajî baweriya gel, bi xêzkirina vî sînorî, ne tenê yedekên petrola Mûsil-Kerkûkê ji dest çûn, her wiha Kurd jî ji dest dan, biratiya dîrokî ya Kurd-Tirk ji dest çû, yekitiya çandî ya Kurdan jî winda bû. hemû gelên Rojhilata Navîn winda kirin”. Rêber Apo diyar kir ku serhildana Şêx Seîd a di sala 1925’an de ji bo veşartina vê xiyaneta dîrokî hem rastî provokasyon û hem jî bi rengekî pir hovane û bi xwîn hat tepisandin û wiha got: “Di vê wateyê de sala 1925’an ne tenê roja destpêkê bû. Serhildan, di heman demê de komplo, xiyanet û qirkirin e. Ev pêvajo jî li dijî Mustafa Kemal hat kirin”. Çavkaniya şoreşgerî ya komarê rastî derfetên serhildanên Kurdan hat. Li ser vê bingehê girîngiya dîrokî ya fêhmkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e ku diyar kiribû divê Peymana Netewî ya salên 1920’an îro weke Pakta Demokrasiyê were sererast kirin. Ji ber ku Rêber Apo ku formula jiyana bi hev re ya gelan pir bi hêz derdixe pêş, bingehên wê yên dîrokî û civakî jî analîz dike. Bi zelalî diyar dike ku berjewendiya hevpar a hemû gelên Anatolya û Mezopotamya, bi taybetî gelên Tirk û Kurd ên bi sedsalan bi hev re jiyane, bi diyarkirina bêwatebûna sînoran ve girêdayî ye. Li şûna wê, girîngiya balkişandina li ser entegrasyona di navbera gelan de ku li gorî xwezaya civakan pêş dikeve, radixe ber çavan. “Em îro dikarin coş û yekîtiya wê rojê di çarçoveya demokrasiyê de biparêzin. Sînorên Pakta Neteweyî yên ku pir jê ditirsin ji hêla Pakta demokratîk ve têne parastin. Ocalan got: “Divê em careke din bi demokrasiyê yekîtiya Kurd-Tirk a wê demê pêk bînin” û ji nû ve avakirina sînoran, di vê mijarê de pêşniyara Konfederasyona Rojhilata Navîn dike. Ev konfederasyon pêşniyarek e ku tê de sînor bêwate dibin, wek ku îro di mînaka YE de tê dîtin. Li vir yekbûn û têkiliyên hevpar ên gelan esas e. Di rastiyê de ev rastiyeke ku di encama têkoşîna ku ev çil sal in tê meşandin de, ev sînorên ku li ser erdnîgariya Kurdan hatine xêzkirin, wateya xwe winda kirine.”

**Siyaseta ku Kurd li dijî Kurdan şer bikin**

Peymana dewleta Tirk a dagirker Herêmên kurdan dagir kirin, bi bikaranîna kurdan ji bo gihîştina sînorên xwe yên netewî tê kirin. Li xaka Başûrê Kurdistanê zêdetirî 25 baregehên leşkerî yên dewleta Tirk a dagirker hene. Ev nîşan dide ku hewldaneke dagirkeriyê heye û gelek herêmên Başûrê Kurdistanê hatine dagirkirin. Ev dagirkerî bi hevkariya PDK’ê desthilatiya herêmên Federe yên Başûrê Kurdistanê pêk tê. PDK û rayedarên wê axa Başûr radestî dewleta Tirk a dagirker dikin. Ev jî berdewamiya peymana Mîsakê Millî ye.

Dîsa di berdewamîya wê hevpeymana berjewendî perest de, di Çileya 2018’an de li ser Efrînê êrişa dagirkeriyê hat destpê kirin û heta 25-26’ê Gulanê Xakurkê a herêma Bradostê berdewam kir. Pêwîste armanca operasyonên dagirkeriyê bi zelalî were dîtin. Di vir de armanca yekem a dewleta Tirk a dagirker ew e ku xwe bigihîne sînorên Peymana Neteweyî. Îro polîtîkayên xwe yên qirkirinê ji aliyê hikûmeta AKP’ê ve tên nûkirin. Wek yên din Parêzvanên vê hişmendiyê bi rêbazên qirêj Kurdan tine bikin û ji dîrokê bidin tinekirin. Polîtîkayên xwe xistine meriyetê. Hişmendîya desteya Îttîhad û Terakkî û hişmendiya AKP’ê-MHP’ê li ser wê bingehê xwe birêxistin û plansaz dike.

# Azadiya Rêber Apo bingeha çareseriya Rojhilata Navîn e

Rojnamevan Xogir Kemal diyar kir ku bi hevdîtina Partiya DEM'ê ya bi Rêber Apo re 7 xalên bingehîn ji raya giştî re hatin parvekirin ku pêwîste di vê pêvajoyê de çi were kirin. Xalên ku Rêber Apo diyar kirin felsefeya Rêber Apo ya têkoşînê û paradigma wî ya bi hevdûre jiyankirina gelan e. Rêber Apo di hevdîtina xwe de jî diyar kir ku hêza wî heye rewşa şer bizivirîne rewşeke siyasî û qanûnî.

**Amara Baran/Qamişlo**

Rojnamevan Xogir Kemal di çarçoveya hevdîtinên DEM partiyê bi Rêber Apo re ji rojnameya me re axivî.

**'Hevdîtina bi Rêber Apo re bi têkoşîn û kedeke mezin pêkhat'**

Xogir Kemal got Piştî 43 mehan hevdîtina ku bi Rêber Apo re çebû bi ked û têkoşîneke mezin pêk hat, pêngava ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî têkoşîna ku hat meşandin û encama wê ye û wiha domkir." Li rojhilata navîn di sala 2023'an de gelek guhertinên bingehîn û bi lez çêbûn. Şerê Hamas û Israîlê û piştî wê şerê Hizbullah û Israîlê û ketina sûriyê mijarên pir bilez bûn ku di nav salakede pêşketin, herkes baş dizane ku Israîl li gel tirkiye û hêzên din şerê hegemonîk dike, û heryekê dixwaze herem di bin serweriya wî de be, Dewleta tirk niha di nav tirsekê de ye ku di sistema nû de ji derva nemîne û kurd ji dest wan neçin. Çalakiya li Tûsaşê ku çêbû maskeya Dewleta tirk daxist ku gotinên Bahçelî di meclîsa tirkiyê de kir pêk neanî, di bingeh de ji ber ku rewşa dewleta tirk di rewşeke xirab da ye ji bo wê jî pêwîstiya wan bi Rêber Apo heye, li ser wî esasê xwe avêtin bextê Rêber Apo ku wan ji qirîz û qeyranê xilas bike."

**'Rêber Apo xwedî pilan û projeye'**

Xogir anî ziman ku Dewleta tirk ji derveyî desthilat û êrîşên zalimane tu proje di destê wan de tuneye û got" Hemû zanyarên cîhanê jî vî îtîraf dikin ku di rojhilata navîn de kesek wek Rêber Apo xwedî plan û proje û pêşerojê difikire di dunyayê de tuneye, di 26 salên dawiyê de Rêber Apo bi hebûna paraznameyan û nîqaşên pêvajoya ku bi rêve bir ev yek zêdetir ispat kir. Tiştê ku Rêber Apo dibêje li cem tevgera azadiyê zelal e, lê Dewleta tirk dixwaze ku Rêber Apo û gelê kurd bike xizmeta xwe ku bi tinekirina gelê kurd hebûna xwe bide qebûlkirin. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn siyaseta ku Ataturk rêva dibir niha dewleta tirk jî dixwaze wê siyasetê rêve bibe, Projeya dewlet bahçelî û Erdaxan yekin û li ser esasê tunekirin û tasfiyekirinê ye.

**'Çareseriya aloziya Rojhilata navîn li îmraliyê ye'**

Xogir balkişand ser girîngiya Hevdîtina Rêber Apo ya bi heyeta DEM partiyê re û wiha got " Rêber Apo 7 xalên bingehîn diyarkirin ku divê pêvajoyê de çi were kirin. Ev rêgezên ku Rêber Apo diyarkirin felsefeya Rêber Apo ya têkoşînê û paradîgma wî ya bi hevdûre jiyankirina gelan û çareseriya siyasî ye. Rêber Apo di hevdîtina xwe de jî diyar kir ku ew hêza min heye ku rewşa şer bizivirînim rewşeke siyasî û qanûnî. Dewleta tirk xwest ku di hevdîtina yekem de bigihêje hindek encaman, lê Rêber Apo qebûl nekir û herkes kir şirîkê vê pêngavê û ji bo wê xwast ku heyet biçe serdana hemû partiyên mihalîf û desthilatê bikin. Heyet li ser daxwaza Rêber Apo ziyaretên xwe bi hemû partiyan re domand, edî şande pêwîste biçe îmraliyê û hevdîtina xwe ya dûyemîn bi Rêber Apo re pêk bîne. Her gavek Rêber Apo hêvî û hewayek erênî di nav gelan de çêdike ji ber ku Rêber Apo di cîhanê û Rojhilata navîn de xwedî projeyeke pozîtîfe ji bo wê jî herkesek ji bona azadiya fîzîkî ya Rêber Apo di nava xebat û têkoşînê de ye. Dewleta tirk ji 2016'an heta niha ku rê girt û şerkir di wan salên dawiyê de yên ku wendakir dewleta tirk bixwe bû. Rêber Apo di hevdîtina xwe ya 2016'an de jî ji şandeyê re got ku hûnê dîse werin û dewleta tirk ji ber ku ket tengaviyê dîsa hişt ku şande biçe cem Rêber Apo. Ji ber ku mifteya çareseriyê ya rojhilata navîn û tirkiyê Rêber Apo ye. Her hevdîtinek bi Rêber Apo re û diyalogên Rêber Apo ji bo gelê kurd û rojhilata navîn cihê hêviyê ye."

**'Dewleta tirk siyaseta qirkirinê dide meşandin'**

Xogir bibîr xist ku " Dewleta tirk ji ber ku ne xwedî projeya çareseriyê ye ji aliyekî ve dixwaze şantajan bike ji aliyê din ve jî dixwaze şerê taybet bide meşandin û bi Rêber Apo, ji hereketê tawîzan bigre ji bo wê jî zimanê xwe yê şer û qirkirinê tûj dike. Di destekî wî de çek û şer heye di destê din de jî siyaset heye, bi destekî lê bixe destê din tune bike. Ev siyaseteke kevin ya Osmaniyane û Ingilîze, li aliyekî de behsa aşitiyê dike li aliyê din jî êrîşê Rojava dike



û dibêje an hûnê teslîm bibin an jî emê we bi tevê çeka we binerd bikin dike û li bakurê kurdistanê jî qeyûm davêje ser îradeya gelê kurd. Zîhniyeta dewleta tirk li ser wî esasê hatiye avakirin, pêwîste gelê kurd vê baş bizanibe ku Dewleta Tirk li çareseriyê nagere li teslîmbûnê digere daxwaza wî ewe ku tevgera azadiya kurdistanê teslîm bigre, bi vî rengî dixwaze siyasetek qirêj bide meşandin."

**'Armanca dewleta tirk di navbera Rêber Apo û tevgera azadiyê de qutbûnê ava bike'**

Xogir got ku dewleta Tirk armanca wê ewe ku tevgera azadiyê û Rêber Apo ji hev cuda bike, difikirin ku cem partiya DEM'ê û Rêber Apo mesele çareser bikin ku tevgera azadiyê ji holê rakin. Û got" Bi şerê taybet dixwazin ku parçebûnê di nav tevgera azadiyê de çêbikin. Tevgera azadiyê di daxuyaniyên xwe de jî dabû diyarkirin ku Rêber Apo ji bo çareseriyê çi bêje em amadene. Ew hêviya parçebûnê di dewleta tirk de şikest, ji bo wê yekê di axaftinê dawiyê yê baxçelî û Erdoxan de bê hêvîbûn diyar dibû ku siyaseta ku wan dixwest bi ser neket. Ew 26 salin tevgera azadiyê pir vekirî dibêje ji bilî Rêber Apo, em tu hevdîtinan pêk naynin Rêber Apo çi bêje emê wê bikin, rêbazên Rêber Apo rêxistiniye tu caran şexsî tevnegeriya ye, lê dewlet dixwaze parçe bike û bi rêve bibe. Li ser Rêber Apo û Tevgera azadiyê vê zîhniyetê meşandina wê zehmete, dewleta tirk nikare li ser Rêber Apo û PKK'ê siyaseta parçebûnê bimeşîne. Ji ber ku hereketeke xwedî îdeolojîk û paradîgmaye, ji bo wê ne mumkune ku dewleta tirk bigihêje armanca xwe."

**'Zimanekî kilasîk û bê çare bikartîne'**

Xogir got ku dewleta tirk qonaxa heyî pir cidî nagire dest û berpirsiyar tevnagerin, ev jî ne samîmiyeta wan dide diyar kirin û got" heta niha Dewleta tirk bixwe jî nizane çi dixwaze heta ku nav li vê qonaxê bikin, ji ber wê jî zimanê kilasîk û bê çare kartînin dewleta tirk bi kuştin û talankirinê nagihêje encamê. Di rastiyê de dewleta tirk cesaret nake ku nav li qonaxê bike, qonax ji bo çareseriyê ye ku êdî şer û pevçûn bi dawî bike. Rêber Apo di vê qonaxê de bi berpirsiyar tevdigere ji bo wê jî projeyên wî ji bo çareseriyê heye, ne tênê ji bo kurdan ji bo tevahî gelan, jin û ciwanan tevdigere, hevdîtin hê berdewam dikin û bi wan hevdîtinan re wê pêvajo ber bi çareseriyê ve biçe. Rûxmê ku dewleta tirk zehmetî û astengiyan çêdike jî, lê Rêber Apo xwedî îrade û hêza çareseriyê ye.

**'Ancax Rêber Apo dewleta tirk ji alûzî û qeyranan derbixe'**

Xogir di dawiyê de got ku " pêwîste dewlet şerê li ser Rojava, qeyûm û girtinan bide seknandin. Û pêwîste girtiyên siyasî yên ku di bin navê terorê de di girtîgehên tirkiyê de girtîne werin berdan. Pêwîste êdî aşitiya civakê pêk were. Dewleta tirk rê veke ku herkesek bi ziman û nasnameya xwe tevbigere û derfet were dayîn ku Rêber Apo hin zêdetir bi erkê xwe rabe. Wê demê tirkiyê bi xwe jî ji alûzî û qeyranan derbikeve, ger wisa nebe rewşa tirkiye wê ji niha xirabtir bibe û nekaribe bi alûzî û qeyranan berdewam bike. Di vê qonaxê de hemû rojnamevan nivîskar û siyasetmedar ji bo ku deste Rêber Apo xort bikin têkoşîn bikin, ji bo ku êdî li kurdistanê xwîn neyê rijandin pêwîste destê Rêber Apo were xortkirin. Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêngav didome û li ser vî esasê wê sala 2025 bibe sala azadiya fîzîkî ya Rêber Apo.




## Berxwedana Bendava Tişrînê rastiya bê dawî nîşan da!

**Dilyar Cizîrî**

Piştî Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) li Helebê li dijî rêjîmê êrişeke berfireh da destpêkirin, gelek hesabên cûda derketin holê, lê tu kesî bawer ne dikir di nava çend rojan de ne tenê Heleb, lê belê Tevahî herêmên Hikûmeta Şamê bikevin destê HTŞ'ê de. Bi vê rewşê re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî guhertinek mezin hate jiyankirin.
Dewleta Tirk a ji destpêka aloziya Sûriyê û heta niha bi hemû hêza xwe kar dikir, dawî li Rêveberiya Xweser û hêzên wan ên leşkerî bîne, hewldanên xwe bi plan û rengên nû dewam kir. Xweser civaka Sûriyê û bi taybet di hindirê Bakur û Rojhihilatê Sûriyê li dijî Rêveberiya Xweser sor bike. Aloziyê di nava pêkhateyan de ava bike, û tişta bi serê hikûmeta Esed û Artêşa wî hat, bi serê Rêveberiya Xweser û QSD'ê bîne.
Di çend rojên destpê de wan wiha hesab dikir ku plana wan ber bi serkeftinê ve diçe. Ev bi taybet dema Rêveberiya Xweser ji bo parastina koçberên Efrînê biryara valakirina Kantona Efrîn-Şehbayê da û bi dagirkirina Minbicê derket tûtkeyê. Dewleta Tirk wiha hêvîd kir Artêşa wê ku bi navê çeteyên "Artêşa Niştimanî" êrişî Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê kirin, wiha hêvî dikir ewê pişta Rêveberiya Xweser bişkîne û planên xwe yên dagirkeriyê di tevahî Sûriyê de feriz bike. Ji bo pêkanîna wê li dijî Bendava Tişrîn û Qereqozaq hemû cûreyên çekên şer ji balafirên şer û yên bê mirov bigre û heta top û tangên herî giran bikar anî.
Lê tişta bû, ne li gorî planên dewleta Tirk bûn. Şervanên QSD'ê li Tişrîn û Qereqozaq tevî dijwarî û tundiya êrişên bi serkêşiya Artêşa Tirk û beşdariya hezaran çeteyên herêmî, berxwedanek bê hempa û dîrokî nîşan dan. Lê zêde bike gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyayê yên bi armanca parastina Bendava Tişrînê bi karwanan meşiyan. Dewleta Tirk bi balefiran êrişî karwanê gel kir, bi dehan şehîd û birîndar çêbûn. Di nava Şehîd û birîndaran de Rojnamevan û Hunermend Bavê Teybar ê bi nav deng jî hebû. Lê tişta balkêş îradeya gel ne şikest û heta niha nobedariya li ser bendavê dewam dike. Bavê Teybar jî di nav de peyamên hevalên Şehîd û birîndaran ên têkbirina tirs û mirinê û çirandina navê wê, her wiha digotin; em ji mirinê mezintirin.
Ev rihê berxwedanê hemû denge dan guhertin, dijmin berî dostan matmayî hiştin. Her kesî got ev çi rihe di van rewşên herî dijwar de pelên dîrokê ji nû ve vejîn dike. Îro bi rihê berxwedana gelê Şoreşgerî ya Benava Tişrînê gelê kurd yekîtî qezenc kir. Ne tenê wiha bi hemû gel û pêkhateyên din ên herêmê re yekîtiya xwe hîn xurtir kiriye.
Destkeftî û serkeftin tenê di vir de sînordar nemaye, em dibînin li Humis, Hema, Şam, Tertûs, Laziqiyê û gelek herêmên din ên Sûriyê bang li QSD'ê dikin, da ku wan ji êrişên nijatperestî yên dewleta Tirk û hevkarên wê biparêze. Berxwedana Bendava Tirşînê careke din rastiya ku bêyî pergala netewa demokarîk çareserî ne li Sûriyê û ne li Rojhilata Navîn pêkane, derxist holê.



# Di pergala nû ya cîhanê de rola dagirkeriya Tirk



**Volqan Elî**

Dewleta dagirker a Tirk di mercên şerê cîhanê yê 1. hatibû avakirin. Rewşa siyasî ya Rojhilata Navîn û cîhanê di wê serdemê de dest dida ku ew hebûna xwe pişrast bike. Çima? Ji ber ku li aliyê rojhilat, yanî li şûna împaratoriya Rûs, şoreşeke sosyalîst ava bibû. Ev ji bo moderniteya kapîtalîst xetereyeke mezin bû. Li ber wê xetereyê, eger ji aliyê moderniteya kapîtalîst ve bihata bêbandorkirin, wekî dîwarekî xwezayî dikaribû belavbûna li cîhanê ya Şoreşa Sosyalîst asteng bike.
Di serdema şerê cîhanê yê duyemîn de jî ev rewşa jeostratejîk a dewleta faşîst a Tirk berdewam kir. Ne tenê dewam kir, mirov dikarê bêje hê jî zêdetir bû. Ji ber ku di encamê şer de Yekîtiya Sowyetê (Rûsyaya Sosyalîst) hê jî bandora xwe zêde kiribû. Ji bo tevgerên rizgariya neteweyan û tevgerên sosyalîst di asta cîhanê de bibû çavkaniya îlhamê. Yanî li ser moderniteya kapîtalîst bibû xetereyeke mezintir. Girêdayî bi vê rewşê, girîngiya stratejîk a dagirkeriya Tirk jî bi caran zêdetir bû.
Di salên 1990'an de dema ku Rûsya Sowyetê hilweşiya, ew girîngiya berê ya dagirkeriyê ji bo moderniteya kapîtalîst nema. Ji ber vê sedemê, dema ku di salên 2021'an de projeya Rêya Enerjiyê ya ji Hindistan heya bi Ewrûpayê kete rojevê, dewleta faşîst a Tirk derveyê projeyê hate hiştin. Bêguman sedem ne tenê ev bû ku derve hate hiştin. Ya din, dewleta dagirker a Tirk bi pêşengiya Erdoğan malovaniya hemû rêxistinên Îxwanî û cîhadîst dikir. Bandora hêzên Îxwanî û cîhadîst, hem li ser ewlekariya Îsraîl gefeke mezin e û hem jî wekî hedefa nêzîk li ser Rêya Enerjiyê xetereyeke mezin dihate hesibandin. Ev rastî,ne ku tehlîlek yan jî texmînek e. Şerê heyî yê di navbera Hamas û Îsraîlê de li ber çav e. Xuya ye dewleta dagirker a Tirk, ji vê rewşê derbeyeke mezin girtiye. Hem jî derbeyeke dîrokî...
Tê zanîn, qewmê Tirk di 1071'ê de bi alîkariya Kurdan li Anatoliyê bi cih bûn. Ev, bi taybet ji bo Tirkan di asta man û nemanê de girîng bû. Dîsa di encama tifaqa 1514-16'an li dijî Safewiyan hem Safewî têk birin û hem jî bûn împaratoriyeke cîhanî. Bi heman rengî di şerê rizgariya neteweyî yê bi pêşengiya M. Kemal, bi tifaqa eşîrên Kurd bi ser ketin. Me ev her sê mînak çima anîn bîra xwendekaran? Yanî Kurdan sê caran ew şans dane ku qewmê Tirk, li cihekî wekî Anatolî yê xwediyê jeostratejiyeke girîng bimînin. Tifaqa yekemî û ya duyemîn di astekê de ji bo Kurdan jî kêr hatiye; lê ya sêyemîn ji ber komplo û xapandinan ji bo Kurdan bûye kareseteke mezin.
Di encamê de piştî bi sedan sal, cara yekemîn girîngiya stratejîk ku encameke tifaqa gelan bûye, îro ji destê dagirkeriya Tirk derketiye. Çi maye di destê dagirkeriya Tirk de? Erê, di destê wan de jî hin tişt mane. Ew jî ne bê alternatîf in. Niha hemû rêxistinên Îxwanî, cîhadîst, mafya, kontra û hwd. Di destê wan de ne. Ji artêşa millî ya Sûriyê bigire, ji Hamasê bigire heta bi kîjan hêzê di binê kontrola wê de ne. Ew ê bi van hêzan çi bike, ji berxwedana li bendava Tişrînê diyar e. Tevkujiya li ser gelan. Piştî ku HTŞ'ê ket Şamê bi çend hefteyan li ser jinên Şam û Helebê ferz kir ku ew li gorî şerîatê xwe binuxumînin. Ya din jî, ne tenê li derveyê Tirkiye di tevgerê de ne. Li Tirkiye roj tine ku zarokek 4-5 salî bi tecawizê re rû bi rû nemîne. Ev kiryar bi piranî ji aliyê kesên xwediyê vê zêhiyetê û heta rasterast ji aliyê girêdayî dewleta Tirk ve tên kirin. Mînak, ew serpêhatiya Narîna biçûk hê nehatiye ronî kirin. Wekîlên AKP bi xwe gotin, "em dizanin lê em nikarin aşkere bikin".
Ya din jî, dibe ku Hîlala Şîa ya ku çepereke Îranê bû derb xweriye. Lê niha jî heman xeteraya li ser Îsraîl û welatên Ereb, bûye dagirkeriya Tirk. Çima? Ji ber ku hemû hêzên Îxwanî û cîhadîst di berîka Erdoğan de ne. Wekî sêhêrbazekî, kengî bixwaze ew ê ji binê kumê xwe Hamas yan jî DAIŞ'eke nû derxîne. Ne dûr e ku rola nû ya dewleta dagirker ya Tirk ev be. Xuyaye ku dewleta dagirker lingê Îranê ji herêmê şemitandiye. Lê vê carê jî ew bi xwe ketiye ber rola Îranê. Angu kengî ewlekariya Îsraîl û dewletên Ereban ket xeteriyê, wê ji dewleta Tirk bizanin. Berê bav û kalan gotiye, "yê ku bikeve govendê destê xwe radike". Yê ku destê xwe di ser Hamasê re bigire, wê ji aliyê Îsraîl û dewletên herêmê ve bi gulan neyê pêşwazîkirin.

## Pêwîste Gelê Sûriyê çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bike



**Zekî Bedran**

Li Sûriyê rejîma nû çawa dê teşe bigire? Welatên Ereb di vê mijarê de hewildan û serlêdanên xwe didomînin. Di heman demê de DYA û welatên Ewropayî jî, xebatên di heman şêvazê de berdewam dikin. Ti kes naxwaze, desthilatiya demkî bibe bela serê cîhanê. Metirsiyek mezin heye, sedema wê metirsiyê jî, HTŞ şaxekê ji çekdarên El Qaîdê ye. Niha jî serkirdeyên HTŞ'ê dibêjin me xwe li El Qaîdê qut kiriye hewildidin baweriya raya giştî bigirin.
Di pişt van hewildanên baweriyê de jî dewleta Tirk heye. Dewleta Tirk hewil dide ku li Sûriyê desthiladariyek ji rejîma Baas'ê hişktir bê avakirin. Hertim tîne li ser ziman û dibêjin Sûriyekî navendî. Sûriyekî bi yek destî di bin desthilatiya HTŞ'ê de, dê her kes li rejîma Baas bigere. Rejîma Baas netewperestiya Ereb derxistibû pêş, lê HTŞ'ê şêwaz guhert û ol jî tevlî kir. Ev dê bibe rejîma qedexeyan û li kêlekê jî, gel û civakê bike xulamê xwe.
Dewleta Tirk çima karê Sûriyê yê hindirîn ji nêz ve têkildar dibe? Çima ji bo ava kirina desthilatdariyek tûndrew û hişk evqas bi israr e? Em bêjin tirsa wan ya sereke kurdin. Pêwîste ev xal teqez bi deng bibe. Tirkiye naxwaze Sûriyekî demokratîk bê avakirin. Sûriyeke nenavendî ji bona xwe weke metirsî û xeteriyekê dibîne. Ji ber ku di Sûriyekê demokratîk û nenavendî de, dê Kurd jî cih bigirin û bibin xwedîyê statû. Ji ber vê yekê jî, pergala netew-dewlet û desthilatiya yekdestî de bi israr e û ji bo rejîmeke li gor xwe bide sazûman kirin. Ji ber ku dide payinkirin ku vê piştgiriya xwe ji bona HTŞ'ê daye diyarkirin ku ev hatiye ser desthilatiyê, ew hesab dike ku ew ê zextê bike û bandorê li rêveberiya nû jî bike. Bandora xwe ya gengaz ne ji bo Sûriyeyeke demokratîk, ji bo rejîmeke despotîk bikar tîne.
Weke ku hat diyarkirin jî, hêzên girîng ên cîhanê bi avakirina Sûriyeyê re eleqedar in. Berjewendiyên wan li gorî berjewendî û xemên wan in. Ev hêz hesab nakin ku gelê Sûriyê çi dixwaze û kîjan modêla rêveberiyê ji bo gelan dê baştir be. Li vir divê em werin ser pirsa rast: Gelê Sûriyê di van mijaran de li ku ye? Gelo hêzên din yan gelê Sûriyê dê biryara çarenivîsa gelê Sûriyê bidin?
Dema desthilatiya Beşar Esad de Sûriye zêdetir hatibû dabeşkirin. Rewşenbîr û aliyên muxalîf hejmarek zêde koçberî derveyî welat bibûn û tevlîhev bibûn. Herêmên xweser ji herêmên din hatibûn qûtkirin. Ji xwe rêjeyek mezin ji xaka Sûriyê ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve hatibû dagirkirin. Li wan herêman li gor xwe rêxistinên çekdarî ava dikirin û didan meşandin. HTŞ'ê jî, li Idlibê bû. Ev rewşa dabeşkirinê ne tene girêdayi erdnigariyê bû. Piranî ji rewşa bîrdozî û siyasî qutbûyin dihate jiyankirin. Di heman demê de, ji ber ku salên dirêj li Sûriyê ji aliyê yek partî dihate rêvebirin çandekî demokratik tine bû.
Niha di rewşa heyî de guhertin çê bû, rejîma Baas ji holê rabû. HTŞ'ê ji Idlibê derket û belavî qadên berfireh bû. Herêmên ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagirker ve hatibûn dagirkirin hîn di bin serweriya komên çete de cih digirin. Ti niyeta hikûmeta AKP-MHP'ê nîne ku dawî li dagirkeriyê bîne û hêzên xwe vekişîne. HTŞ jî, vê yekê ferz nake û naxe rojev. Ji ber vê jî, dewleta Tirk destê wê azad e û dixwaze xwe bispêre herêmên dagirkirî û bixe bin serweriya xwe. Di heman demê de HTŞ'ê ji bona Sûriyekî azad bawerî nade. Weke bîrdozîk jî, dijî pergalekî demokratîkin. Ji neha ve diyar e ku ew ê derfetê bikar neynin ku bandorê li herêmên berfireh bikin û li Sûriyê ji bo demokrasiyê ristekî mezintir bilîzin. Metirsiya pêkhatineke dij-şoreş û dij-demokratîk a ku ji ber rewşa nû derketiye holê heye. Divê ev yek timî li ber çavan bê girtin. Lê belê, derfet û firsendên rewşa nû jî hene. Ji bo vê yekê ji bo Sûriyekê demokratîk bikar bînin, divê gelê Sûriyê mudaxele bike. Demokrasî dê ji bo kesên ku herî zêde pêdiviya wan bi wê heye bikeve meriyetê. Eşkere ye ku ev gelê Sûriyê bi xwe ye. Feqîr, bindest, jin û rewşenbîr êdî zêdetir in. Pêwistî heye ku bi bandor bin û xwe birêxistin bikin. Pirsgirêk hene, lê derfet jî hene. Niha hemû pêkhateyên ku li tevahiya Sûriyê jiyan dikin, derfetên van hene ku zêdetir xwe bigihînin hev û ji ezmûnên hev sûd werbigirin. Pêwîst e van derfetan baş bi kar bînin.
Ezmûna Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke firsend û modêleke mezin e. Hemû pêkhate, çand û baweriyên Sûriyeyê dikarin di nava şert û mercên wekhev de bi hev re bijîn. Bi pergala komînar xwe bi awayekî demokratîk birêve bibin. Divê ev rêveberî bibe modêla tevahî Sûriyê. Divê hemû herêm bi hev re tevbigerin û xwe birêxistin bikin. Yekîtiyên demokratîk bên avakirin û hevpeymana mûxalefetê ya bi bandor dikare li dijî şoreşê û ferzkirina yekdestî têk bibe. Lê eger gel bi awayekî bi bandor çarenûsa xwe negire destê xwe, wê çarenûsa gelê Sûriyê ji aliyê hêzên derve û dagirkeran ve bê diyar kirin. Ev yek jî li Sûriyê derî ji serdemeke nû ya tarî û pevçûnan re veke. Ji bo Sûriyeke demokratîk pêwîste di kar û xebatên xwe yêkbûyinê bingeh bigrin. Dewleta Tirk her tim hewl dide Kurdan weke çavkaniya metirsiya cudaxwaziyê nîşan bide. Lê Kurd niha rêza herî bibandor hem di yekîtî û hem jî ji bo demokratîkbûna Sûriyeyê de ne. Divê gelê Kurd hem li hundir hem jî ji derve rista avaker a ku dilîze bibandor û rast rave bike.



## "Heyet ji giravê vegeriya?"

**Farûk Sakik**

Heyeta Îmraliyê ya Dem Partî di 22'yê çileya 2025'an de li Îmraliyê duyemîn hevdîtina xwe ya bi Rêber Apo re pêk anî. Der barê hevdîtinê de nîqaşan dest pê kir. Çandek-kevneşopiyek hevdîtinên Îmraliyê hebû. Piştî hevdîtinan daxuyanî dihatin dayîn. Herkes li bendê bû da ku heyet vegere wê daxuyaniyek çawa bide. Di muzekereyên berê de jî (salên 2013-2014-2015) dema ku heyet diçû Îmrali herkesî ji hev dipirsî "heyet ji giravê vegeriya?"
Evcar jî heman bendewarî hebû. Lê bersiv nedan vê bendewariyê. An jî tiştên ku bi çapameniyê re hatin parvekirin cîvak têr nekir. Piraniya civakê li bendê ye, wê çi bibe çi nebe. Hesretek wan a bi salan hebû. Piştî tecrîdê, li Tirkiyê faşîzm derket asta herî jor. Li hember Kurdan, siyaseta salên 1925'an dihat meşandin. Kurdan digot, heger Rêber Apo azad bûya wê midaxaleyî vê pêvajoyê bikira û ev hovîtiya li ser gelan bida seknandin. Ango jixwe li bendê nebûn, di vê hevdîtinê de wê bangî çek danînê yan jî dawî anîna şerê çekdarî bike neke. Civak vê dewletê û vê hikûmetê baş nas dike. Dek û dolabên wan jî dizanin. Daxuyaniyên wan didan bawerî neanînin û li benda Rêber Apo bûn. Dema daxuyaniyek têrker nehat dayîn, di nav gel de bê moraltî û bêhêvîtiyek peyda dibe. Ji ber vê yekê di serî de DEM Partî û hemû peywîndîdar divê bi rengekî hesas tevbigerin. Lê dîsa jî hin notên hevdîtinê yên ku hatin parvekirin, kodên paşeroja hevdîtina dida zelal kirin.
Rêber Apo di beşek axaftina xwe de dibêje; "Tekane çareseriya ku wê Tirkiye, Sûriye, Iraq û heta Îranê rizgar bike ev e; bi gelên li nava xwe re aşitiyê çêkin û zemînê demokratîk ava bikin. Îran jî tenê bi vî awayî dikare xwe biparêze" Rêbertî ev e. Ev gotin dide xuyakirin ne bi tenê ji bo Bakurê Kurdistan li 4 parçeyên Kurdistan çareseriyê esas digire. Rêber Apo ji bo çareseriyek dîrokî amadekariyan dike. Perspektîfên wî yên çareseriyê wê derî li hemû destwerdanên hêzên emperyalîst jî bigre. Dibêje; yan hûn ê bi min re çareser bikin an jî wê hêzên emperyal midaxle bikin. Ev gotinên wî şaş hatin fahm kirin. Yên xwe di tarîtiyê de veşartibûn, heman êriş kirin. Gotin, Amerîka dixwaze doza Kurdistan çareser bike, lê Rêber Apo vê yekê naxwaze.
Amerîka li gor berjewendiyên xwe bi Kurdan re hevkariyê dike. Daxuyaniyên baş yên xwedî derketina rêveberiya xweser hene. Di vî warî de tu nîqaş tune. Lê ji bo parçeyên din û bi taybet ji bo Bakurê Kurdistan tu perspektîfên wan ê çareseriyê nînin. Haa tê gotin, êrîşên dewleta Tirk yên li derdora bendava Tişrînê da seknadin. Rast e, lê çeteyên dewleta Tirk hê jî êrişî Tişrînê û sivîlên herêmê dike. Amerîka dikaribû van êrişan bide sekinandin da kû evqas kesên sivîl şehîd nebûna. Lê midaxale nekir. Heyeta ku diçe Îmrali hevdîtinan bi Rêber Apo re pêk tînin di vegerê de divê balder bin. Hesasiyetên civakê berçav bigirin. Rêber Apo, ne ji bo çareseriyeke di navbera îqtîdar û Îmraliyê de, ji bo çareseriyeke civakî amadekariyên xwe dike. Aştî û çareserî wê bi civakbûnê bi pêş bikeve. Ji bo vê yekê bendewariyên civakê divê esas werin girtin. Dema manşêtek an jî sernivîsek hebe, dibe ku bingeha xwe têr û tijî be. Di naverokê de tu tevlîheviyek tune be. Tu tiştek ji civajê û ji gelan neyê veşartin. Divê bersiva "Heyet ji giravê vegeriya?" were dayîn.